Peyamên Sereke li ser Bicîhanîna Fermana Serokatiyê Hejmar 13 li ser Xwezayîkirina Kurdan

Yekem: Agahiyên giştî li ser biryarnameyê û kesên ku ew digire nav xwe

Pirsa 1: Ew kesên ku dikarin ji vê fermanê fayde bistinin kî ne?

Bersiv: Ev ferman ji bo her Kurdê Sûriyê yê ku li axa Sûriyê dijî û mafê hemwelatîbûnê wernegirtiye an jî wekî bêwelat hatiye tomar kirin, derbas dibe.

Pirsa 2: Wergirtina hemwelatîbûna Sûriyeyê tê çi wateya ye?

Bersiv: Ev tê vê wateyê ku hûn ê bi fermî di qeydên welatiyên Sûriyeyê de werin tomar kirin, hejmareke neteweyî bistînin, bikaribin nasnameya kesane û belgeyên din ên medenî bistînin, û li gorî qanûnên derbasdar ji mafên xwe yên hemwelatîbûnê fayde bistînin.

Pirsa 3: Ev ferman tenê ji bo parêzgeha Hesekê derbas dibe, an ji bo parêzgehên din jî derbas dibe?

Bersiv: Niha li parêzgeha Hesekê û Şamê çend navend hene. Li Hesekê, sê navend ji bo wergirtina serlêdanên ji bo bidestxistina hemwelatîbûnê hatine destnîşankirin, û navendek li parêzgeha Şamê jî hatiye destnîşankirin. Ev yek piştî biryara dirêjkirina biryarnameyê ji bo panzdeh rojên din tê ku ji 5ê Gulana 2026an pê ve dest pê dike.

Pirsa 4: Dema wergirtina serlêdanan dê kengê dest pê bike, û gelo demek taybetî ji bo şandina serlêdanan heye??

Bersiv: Navendan roja Duşemê, 6ê Nîsanê, dest bi qebûlkirina serlêdanan kirin. Dema serlêdanê ya mehekê ku berê hatibû dayîn, heya mehek û nîvekê hatiye dirêjkirin, bi 15 rojên zêde ji roja ku komîteyan dest bi karê xwe kirine dest pê dike. Ger pêwîst be, ev dem dikare bi biryara Wezîrê Karên Hundir bê dirêjkirin. Ji ber vê yekê, ji serlêderan tê xwestin ku serlêdanên xwe zûtir pêşkêş bikin û li benda rojên dawîn nemînin.

Duyem: Serlêdan wê li ku derê were pêşkêş kirin û meriv çawa dikare bigihêje navendan

Pirsa 5: Ez serlêdana xwe ya hemwelatîbûnê li ku derê pêşkêş dikim?

Bersiv: Serlêdan li navendên pêşwaziyê yên destnîşankirî bi vî awayî tênе pêşkêş kirin:

1. Parêzgeha Hesekê (Sê Navend):

Bajarê Hesekê: Meclîsa Bajar, Bajarê Qamişlo: Meclîsa herêmî (Stadyûma Belediyê), Cewadiyê: Meclîsa herêmî

2. Parêzgeha Şamê:

Rêveberiya Karûbarên Sivîl.

Pirsa 6: Ma ez dikarim serlêdana xwe li her yek ji van navendan pêşkêş bikim?

Bersiv: Baştir e ku hûn biçin navenda herî nêzîkî cihê rûniştinê an jî wekî ku ji hêla Beşa Karûbarên Medenî ve hatî rêve kirin an tîmên hişyariyê, ji ber ku her navend xwedî komîteyek taybet û tomarên taybetî ye ji bo organîzekirina xebatê.

Pirsa 7: Saetên kar yê navendan çi ne?

Bersiv : Saetên kar ji aliyê rayedarên fermî ve tênе destnîşankirin (bi gelemperî di saetên karê fermî yên sibehê de). Di serdana xwe ya yekem de an jî bi rêya tîmên hişyariyê li ser saetên kar bipirsin, û hewl bidin ku zû bigihîjin da ku qerebalixî çênebe.

Sêyem: Cureyê serlêdanê û kî wê pêşkêş dike

Pirsa 8: Ez tenê ji bo xwe serlêdanê dikim an ji bo malbata xwe jî?

Bersiv: Du cureyên serlêdanê hene:

- Serledana kesane: Kes li ser navê xwe pêşkêş dike.
- Serlêdana Malbatê: Ji aliyê serokê malbatê ve ji bo xwe, hevjîna xwe û zarokên xwe yên temenbiçûk, û her wiha zarokên mezin ên nezewicî, tê pêşkêş kirin. Zarokên mezin ên zewicî divê serlêdanên cuda pêşkêş bikin.

TÊBÎNÎ: DI HEYAMA MEHEKÊ DE KU JI BO PÊŞKÊŞKIRINA SERLÊDANAN HATIYE VEQETANDIN, BES E KU TENÊ SEROKÊ MALBATÊ DEMA PÊŞKÊŞKIRINA SERLÊDANÊ AMADE BE.

Pirsa 9: Serokê malbatê yê ku serlêdana malbatê pêşkêş dike kî ye?

Bersiv: Serokê malê ji bo kesê ku bi gelemperî berpirsiyarê malbatê ye tê gotin - ango bav, di nebûna bav de dayik, an jî birayê herî mezin. Eger serokê malbatê nikaribe serlêdanê pêşkêş bike, dibe ku hevahengî bi navendan an parêzerekî girêdayî UNHCR re çêbibe da ku rêbernameyê li ser prosedûra pêşkêşkirina guncaw werbigire.

TÊBÎNÎ: HEGER YEK JI ENDAMÊN MALBATÊ, BI TAYBETÎ YÊN KU LI DERVEYÎ WELÊT DIJÎN, NE LI MALÊ BE, DIVÊ SEROKÊ MALBATÊ HÛRGULIYÊN WAN DI SERLÊDANÊ DE BINIVÎSE Û DESTNÎŞAN BIKE KU EW NIHA LI WELÊT NÎNIN, JI BER KU DIBE KU DERFETA WAN HEBE KU DI DEMEK PAŞÎN DE SERLÊDAN BIKIN.

Pirsa 10: Gelo xortekî an jî keçekî nezewicî dikare bi tena serê xwe serlêdanê pêşkêş bike?

Bersiv: Belê, ev tenê dema ku malbat tune be derbas dibe

Çaremîn: Pelik û belgeyên pêwîst

Pirsa 11: Belgeyên bingehîn ên ku divê ez bi serlêdanê re pêşkêş bikim çi ne?

Bersiv: Li gorî rênimayên rêveberiyê, divê ev tiştên jêrîn bi serlêdana ji bo hemwelatîbûnê werin pêşkêş kirin:

1. Belgeyeke nasnameyê ya bi awayekî rast hatiye amadekirin û ji aliyê Muxtarê pêwendîdar ve hatiye çêkirin
2. Belgeyeke rûniştinê ku hebûna we li ser axa Komara Erebî ya Sûriyeyê îspat dike, ji aliyê Muxtarê peywendîdar ve hatiye dayîn.
3. Her belgeyeke fermî ku vê hebûnê îspat dike, wek: fatûreya elektrîkê, fatûreya avê, fatûreya telefonê, belgeyeke ku nîşan dide zarokên we li dibistanên Sûrîyeyî qeydkirî ne û ji hêla Rêveberiya Perwerdehiyê ve hatine pejirandin, an jî her belgeyeke din a ku ji hêla komîteyê ve tê pejirandin.

TÊBÎNÎ: BELGEYA RÛNIŞTINÊ TENÊ JI BO SEROKÊ MALBATÊ PÊWÎST E, LÊ BELGEYA NASNAMEYÊ JI BO HEMÎ ENDAMÊN MALBATÊ PÊWÎST E.

Pirsa 12: Belgeya nasnameyê ji Muxtar çi ye, û ez çawa dikarim wê bistînim?

Bersiv : Belgeya nasnameyê kaxezek e ku ji hêla Muxtarê pispor ê herêma ku hûn lê dijîn ve tê amadekirin, ku tê de nasname û hebûna we li herêmê tê behs kirin, û di gelek rewşan de, hejmarek cîran an nasên we tê de şahidiyê dikin. Hûn dikarin serdana Muxtarê herêma xwe bikin û li ser belgeyên pêwîst bipirsin da ku vê belgeyê derxin.

Pirsa 13: Belgeya rûniştinê çi ye?

Bersiv : Belgeya rûniştinê belgeyek e ku îspat dike hûn li herêmeke diyarkirî ya li Sûriyeyê dijîn, û ew dikare ji hêla Muxtar ve were dayîn. Ew navnîşana we ya niha û ji kengî ve hûn li wir dijîn nîşan dide.

Pirsa 14: Fatûreyên elektrîk, av û telefonê li ser navê min nînin; divê ez çi bikim?

Bersiv: Hûn dikarin her belgeyek din bikar bînin ku hebûna xwe li welêt îspat dike, wek:

- Fatûreyên li ser navê endamekî malbatê, ligel delîlên têkiliya we bi wan re.
- Belgeyên dibistanê yên ku îspat dikin ku zarokên we qeydkirî ne.
- Her belgeyeke fermî ku nav, navnîşan, an hebûna we li Sûriyê nîşan dide.

TÊBÎNÎ: HEKE BELGE TUNE BIN, HÛN DIKARIN JI PARÊZERÊN HEVKAR PIŞTGIRÎYÊ BIXWAZIN DA KU RÊBERNAMEYÊ LI SER RÊBAZÊN GUNCAW ÊN DESTNÎŞANKIRINA DELÎLÊN HEBÛNÊ BISTÎNIN.

KOPIYEK JI BELGEYÊN PÊŞKÊŞKIRÎ BI XWE RE BIHÊLIN JI BER KU YÊN ORÎJÎNAL DIVÊ DI SERLÊDANA WE DE LI CEM HIKÛMETÊ WERIN HILANÎN.

Pêncemîn: Piştî pêşkêşkirina serlêdanê çi dibe?

Pirsa 15: Piştî ku ez serlêdanê pêşkêş dikim, komîteya navendê çi dike?

Bersiv: Komîteya li navendê wiha dike:

• Serlêdana we werdigire û di qeydên taybet de tomar dike.

• Bi awayekî şexsî bi we re hevdîtin dike û nasnameya we piştrast dike.

• Serlêdana we digel belgeyên pêvekirî dinirxîne

Dûvre serlêdan ji bo temamkirina vekolîna wan ji komîteyek bin-parêzgehê re têne şandin.

Pirsa 16: Dema ku ez serlêdanê pêşkêş dikim, ez ê wergirtinek an hejmarek werbigirim?

Bersiv: Belê, wergirtinek dê were dayîn. Divê hûn piştrast bikin ku hûn jimara serlêdana xwe an jî her piştrastkirina qeydkirinê ji karmendên navendê - wekî nav, jimara têlefona xwe, û jimara belgeyên pêşkêşkirî - werdigirin û ji bo şopandina pêşerojê biparêzin.

Pirsa 17:Komîteya jêrîn çi ye û çi karî dike?

Bersiv: Ew di nav xwe de karmendên karûbarên medenî digire, yên ku role wan wergirtina serlêdanên hemwelatîbûnê ye.

Pirsa 18: Piştî ku serlêdana min hate nirxandin, ez çawa dikarim encama wê bizanim?

Bersiv: Bi serdana Ofîsa Karûbarên Medenî.

Şeşem: Îtîraz di rewşa redkirina serlêdanê de

Pirsa 19: Ger serlêdana min ji aliyê Komîteya jêrîn ve were redkirin, divê ez çi bikim?

Bersiv: Eger hûn hîs bikin ku ji ber biryara Komîteya jêrîn zirar li we hatiye (bo nimûne, eger serlêdana we were redkirin), mafê we heye ku di nav 30 rojan de ji roja ku encam ji we re hatiye ragihandin, îtîrazek nivîskî pêşkêşî komîteya navendî bikin. Ji ber vê yekê, girîng e ku hûn bizanin ka biryar kengî hatiye weşandin an ragihandin.

Pirsa 20: Ez îtîrazê li ku derê pêşkêş dikim, û ez çawa dinivîsim?

Bersiv: Îtîraz bi rêya dezgeha fermî ya destnîşankirî (bi gelemperî bi rêya Dîwana Karûbarên Medenî an Parêzgehê) ji komîteya navendî re tê pêşkêşkirin. Hûn dikarin ji UNHCR an hevkarê qanûnî yê UNHCR alîkariyê bixwazin da ku di nivîsandina îtîrazek zelal û baş-avakirî de alîkariya we bikin.

Pirsa 21: Ger serlêdana min di dawiyê de were redkirin, ez dikarim biçim dadgehê?

Bersiv: Eger ji aliyê komîteya navendî ve biryareke dawî were dayîn û hûn wê neheq bibînin, hûn dikarin li gorî rêzikên derbasdar mijarê bişînin dadgehên îdarî. Di vê qonaxê de, çêtir e ku hûn alîkariya parêzerekî bixwazin an jî ji hevkarê qanûnî yê UNHCR alîkariyê bixwazin da ku vebijarkên berdest ji we re fêm bikin.

Heftemîn: Piştî ku serlêdan hat pejirandin û hemwelatîbûn hat dayîn

Pirsa 22: Piştî ku serlêdana min hatê pejirandin û hemwelatîbûn ji min re hatê dayîn çi dibe?

Bersiv: Piştî ku serlêdana we hat pejirandin û lîsteya navan ji aliyê Wezîrê Karên Hundir ve hat piştrastkirin, navên we dê di bernameyên taybet de bên derbas kirin û dûv re ji bo bernameya fermî ya elektronîkî ya Karûbarên Medenî bên veguhestin, da ku hûn di qeydên welatiyên Sûriyeyê de werin qeyd kirin. Piştî vê yekê, hûn dikarin biçin Karûbarên Medenî da ku prosedurên wergirtina nasnameyê û belgeyên din ên medenî temam bikin.

Pirsa 23: Gelo divê ez endamên malbatê û zarokan jî qeyd bikim?

Bersiv: Belê, pir girîng e ku meriv piştrast bike ku hemî endamên malbatê, bi taybetî zarok, di serlêdan û tomarên fermî de cih digirin, û piştî bidestxistina hemwelatîbûnê qeydkirina wan di tomarên sivîl de were şopandin, ji ber ku ev yek wan di pêşerojê de ji ketina rewşek bêwelatîbûnê diparêze.

TÊBÎNÎ: HEMÛ XIZMETÊN KU JI HÊLA KOMÎSYONÊ Û HEVKARÊN WÊ YÊN QANÛNÎ VE TÊNE PÊŞKÊŞ KIRIN BÊPERE NE. HER DAXWAZEK JI BO DRAVDANÊ JI HÊLA KESEKÎ KU ÎDIA DIKE KU LI SER NAVÊ UNHCR AN HEVKARÊN WÊ TEVDIGERE, DIVÊ DI CIH DE JI TÎMÊN UNHCR AN DEZGEHA PÊWENDÎDAR RE WERE RAGIHANDIN.

Heştemîn: Peyamên parastinê yên girîng ji bo sûdmendan

Pirsa 24: Gelo ji bo pêşkêşkirina serlêdanê pêdivî bi navbeynkarekî heye?

Bersiv: Pêdivîya te bi navbeynkarekî tune. Tu dikarî bi xwe biçî navendan û serlêdana xwe bêpere pêşkêş bikî. Girêdana bi navbeynkaran dikare te bixe ber îstismara darayî û heke agahiyên xelet an belgeyên sexte werin şandin, serlêdana te bixe xetereyê.

Pirsa 25: Ger karmendek an kesek ji bo lezandina serlêdana min ji min pere bixwaze, divê ez çi bikim?

Bersiv: Divê bûyer di cih de ji rayedarên pêwendîdar re were ragihandin.

TÊBÎNÎ: AGAHIYÊN KU TU DIDÎ JI BO ARMANCA NIRXANDINA SERLÊDANÊ, PIŞTRASTKIRINA NETEWEYÎ Û QEDANDINA TOMARKIRINÊ DI QEYDÊN MEDENÎ DE TÊNE BIKARANÎN. SERLÊDER DIVÊ PIŞTRAST BIKIN KU HEMÎ AGAHDARIYA HATINE DAYÎN RASTIN Û DIVÊ JI PARVEKIRINA DANEYÊN KESANE BI KESÊN BÊDESTÛR AN BÊBAWER DÛR BISEKININ.

Nehemîn:Şîretên girîng ên pratîkî

Pirsa 26: Hun çi şîretê li mi dikin ku berî ez biçim navendê bikim?

Bersiv: Ew çêtir e ku:

- Hemû belgeyên berdest ên ku nasname û rûniştina we li Sûriyê îspat dikin, berhev bikin.
- Piştrast bike ku tu ji Muxtar belgeyeke nasnameyê û belgeyeke rûniştinê werdigirî.
- Ji bo ku qerebalixî çênebe, zû herine navendê.
- Heke pêkan be, kopiyek ji her kaxezek ku hûn pêşkêşî navendê dikin bi xwe re bihêlin.

Pirsa 27: Di vê pêvajoyê de divê ez her tim çi ji xwe re bibîr bînim?

Bersiv: Ji bîr neke ku ev gaveke girîng e ji bo bidestxistina mafên xwe wekî hemwelatiyek, û divê tu piştrast bibî ku agahdariyên rast didî, tu pereyên nefermî nedî, tenê rêyên qanûnî û fermî bikar bînî, û heke tu rastî zehmetiyekê werî, ji UNHCR û hevkarê qanûnî alîkariyê bixwaze.

Hejmarên têlefonên alîkariyê yên SARC (Heyva Sor) li Hesekê:	0950033810 0950033141 0950033142
Hejmarên têlefonên alîkariyê yên SARC (Heyva Sor) li Reqayê:	0995161711 0987027693 0987027692
Parêzgeha Helebê:	0950033236 0950033231 0950033576
Parêzgeha Dêr ez-Zor:	0950033268 0950033893 0950033250
Parêzgeha Şamê:	0950033241 0960088857 0948333853